

OROJA NÛ

kovara huneri çandi û edebi



36
—
1993

**Piştî Şorîşa Şêx Seid
Rapor û Tevdirên Tîrkan
dî Derheqa Serhîdanê û Rewşa Kurdistanê da**

BEŞA IV.

RAPORA ENCUMENÊ

Werger: BARAN

*Piştî hazirkirina rapora Abdîlhalik Renda û ya
Cemil ê Wazirê Karêن Hundur, hukumetê encumenek
(komisyonek) sazkar, ji bo ku li van herdu rapo-*

*ran binêre û ji bo hukumetê raporeke din hazır bike
û tevdîrên ku lazim e bêne stendin pêşniyar bike.
Derheqa vê yêkê da bîryarnama hukumetê ev e:*

Pir bi vesarti ye

Serokweziri

Mîdûriyeta Qelema Xas

Bîryar no: 2536

BIR YARNAME

Jî bîryarnama 17'ê Heziran 341 (1925) bî tarix
û 2086 numro ra zeyl e (dikeve ser wê).

Heyeta Weziran (Hukumetê) dî civina xwe ya
8'ê İlonê 341 (1925) da bîryarek girt û encumenek
çêkir ku tê da Wezirê Karên Hunduri (Cemil),
Wezirê Dadi (Mahmut Esat), Mebûsê Çanqiri Ab-
dulhalik begefendi û Serokê Erkanê Herb ci
digrin, bona ku li raporen nihîberan binêre û di
derheqa wan wilayetan da ku ev bûyera kevnepe-
resti (1) çêbû, çi tevdîr lazim e bîryar bide û wek
raporekê hazır bike; Cemil begefendiyê Wezirê

Karên Hunduri û Abdulhalik begefendi ku li
mîntîqa goti gerine, dîvê heryek raporen xwe pêş-
kêsi encumenê bikin û encumen li ser wan xeber-
de, jê neticeyan derxe û pêşniyarên xwe hazır bike
û rapora xwe dî 15 rojan da temam bike û bide hu-
kumetê.

Serokcûmhûrê Tîrkiyê

Gazi Mustafa Kemal

Serokwezir

Wezirê Dadi

Wezirê Parastina Netewi

Wezirê Behri

İsmet

Mahmut Esat

Recep

İhsan

Wezirê Karên Hundur

Wezirê Karên Derva (vekil)

Wezirê Mali

Wezirê Maarif

Cemil

Mahmut Esat

Hasan Hüsnü

Abdullah Suphi

(civinê da tune bû)

Wezirê Avadani

Wezirê Çandîniyê (v.)

Wezirê Ticari

Wezirê Xweşiyê û Alikariya Cîvaki

Süleyman Sîrri

Ali Cenani

Ali Cenani

Dr. Refik

**Pışti Şorîşa Şêx Seid
Rapor û Tevdîrên Tîrkan
dî Derheqa Serhîdanê û Rewşa Kurdistanê da**

BESA IV.

RAPORA ENCUMENÊ

Werger: BARAN

Pışti hazırlıkına rapora Abdülhalik Renda û ya Cemil ê Wazirê Karêñ Hundur, hukumetê encumenek (komisyonek) sazkir, ji bo ku li van herdu rapo-

ran binêre û ji bo hukumetê raporeke din hazır bike û tevdîrên ku lazum e bêne stendin pêşniyar bike. Derheqa vê yêkê da bîryarnama hukumetê ev e:

Pir bî vesarti ye

Serokweziri

Midûriyeta Qelema Xas

Bîryar no: 2536

BIR YARNAME

Jî bîryarnama 17'ê Heziran 341 (1925) bî tarix
û 2086 numro ra zeyl e (dikeve ser wê).

Heyeta Weziran (Hukumetê) dî civina xwe ya
8'ê İlonê 341 (1925) da bîryarek girt û encumenek
çêkir ku tê da Wezirê Karêñ Hunduri (Cemil),
Wezirê Dadi (Mahmut Esat), Mebûsê Çanqırı Ab-
dulhalik begefendi û Serokê Erkanê Herb ci
digrin, bona ku li raporen nihîberan binêre û di
derheqa wan wilayetan da ku ev bûyera kevnepe-
resti (1) çêbû, çi tevdîr lazîm e bîryar bide û wek
raporekê hazır bike; Cemil begefendiyê Wezirê

Karêñ Hunduri û Abdulhalik begefendi ku li
mîntîqa goti gerine, dîvê heryek raporen xwe pêş-
kêsi encumenê bikin û encumen li ser wan xeber-
de, jê neticeyan derxe û pêşniyarên xwe hazır bike
û rapora xwe dî 15 rojan da temam bike û bide hu-
kumetê.

Serokcûmhûrê Tîrkiyê

Gazi Mustafa Kemal

Serokwezir

Wezirê Dadi

Wezirê Parastina Netewi

Wezirê Behri

İsmet

Mahmut Esat

Recep

İhsan

Wezirê Karêñ Hundur

Wezirê Karêñ Derva (vekil)

Wezirê Mali

Wezirê Maarif

Cemil

Mahmut Esat

Hasan Hüsnü

Abdullah Suphi

(civinê da tune bû)

Wezirê Avadani
Süleyman Sirri

Wezirê Çandîniyê (v.)
Ali Cenani

Wezirê Ticari
Ali Cenani

Wezirê Xweşiyê û Alikariya Cîvaki
Dr. Refik

Rapora Encumenê

Encumen bî wan çar kesan (ji Erkanê Herbê serokê duwemin Kazım Paşa, ango Qerebekir tevlê bû) kom bû û rapor û pêşniyarên jêrin hazır kîr da hukumetê:

1- İdara şidandi li rojhîlatê heya qedimandina bernama jêrin wê berdewam be.

2- Türkiye parva dibe pênc mintiqeyên mifettişiya giştî (ûmûmi). Mifettişiya 5. ji wilayetên jêrê pêk tê:

Hekkari, Wan, Mûş, Bitlis, Sert, Genç (Darahêne), Diyarbekir, Mêrdin, Ruha, Serek (Siwerek), Xarpit, Dêrsim, Meletye, Ergani. Wilayetê Bazide û qezayên Plemori, Gêxi û Xînis heya temambûna vê bernamê, bo demekê, dî bin emrê Mifettişiya Pêncan da be.

Mifettişê giştî, perpirsiyarê rêvebirina bernamê (programê) ye û dî bin emrê wi da ji her wezarete-kê mifettişek û pisporeki eskeri û memûren din hene. Lî wê mintiqê elayên cenderman yê seyyar ji dî bin emrê wi da ne.

Serokê eskeri yê mintiqê ku qumandarê Qoldiyya 7. e, ew ji wek qumandarê idara şidandi dî bin emrê mifettiş da ye.

Heya ku mifettişiya giştî bê avakîrin, mifettişê Ordiya 3. disa bî vi kari mijûl be. Ji bo ku idara şidandi bê firehkîrin û wilayetê Bazide û qezaya Plemoriyê ji bistine bin hukmê xwe û heya dawîya İslahetê bê nukîrin, divê qanûneke nu ji Meclisa Bilind bê derxistin.

3- Dî dadigehêن eskeri û yê idara şidandi da divê ji xelkê mintiqê (ji Kurdan) hakimên esker yan ji sivil nebin. Biryarêni diwana herbê (mehke-ma eskeri) nah şunda ji wek berê bî ci bêñ.

4- Ew kesen sık li ser, ku dî derheqa wan da heya 13'ê Sibata 341 taqibat çê bûye, lê karê wan ne qediyaye, ji bili huquqê şexsi, dewayêni wan wê bêne tecilkirin. Qanûna Tecilê ji bo qisûr û curm û kuştinan be; lê ew kuştinan ku hin neketine bin

1.000.000 Mesrefê neqîlkîrinê, xwarin û hwd. (ji bo meriveki 20 lire hatiye hisebkirin),

250.000 Avakîrina deh hezar xani (ji bo xaniyeki 250 lire),

1.000.000 Bedêla debara salekê, tov (toxim), haleten çandiniyê (ji bo malekê 1.000 lire),

2.000.000 Bedêla bist hezar heywanê cot,

500.000 Mesrefê ciwarkîrinê.

7.000.000

hukmê mirûrê zeman (wext derbazbûnê) û kuştinan ku bî rengê rabûn û serhîdan in -beri serhîdana dawi biqewîmin ji- ew nayêne tecilkirin. Gor vê yêkê, ji meclisa bilind ra qanûnek wê pêşniyar bibe.

5- Lî rojavaya xetta bajarê Wanê û Midyatê, erda ku ji Ermeniyan vala bûye, li wê macirên Türk wê bêne ciwarkirin. Bona vê yêkê, li wilayetên dî mintiqâ idara şidandi da erdê Ermeniyan divê neyê firotin û heya bî kîrê ji nedine Kurdan. Türk û Arnavûdênu ku ji Yugoslavia têñ û macirênu ku ji Iran û Qafqasiyê bêñ divê beri hemûyan li Xarpitê-Erganiyê-Diyarbekrê; Xarpitê-Paloyê-Gêxiyê; dî navbera Palo û Mûşê da li geliyê Muradê, li rojhîlat û başûrê Çiyayê Bingolê û li Xînisê, li geliyê Muradê, li deşta Mûşê, li dorberê Gola Wanê, li xetta Diyarbekir, Bitlis û Xerzanê wê bêne ciwarkirin û ji bili vana, ji gelê ku li wilayetên Rize û Trabzonê û li qezayên li rojhîlata bakûrê wilayetê Erzurumê bi sixleti diji, ji wan ji yêñ ku bî dil û daxwaz têñ, divê li dor çemê Xînisê û ava Muradê û li bakûrê Gola Wanê bêne ciwarkirin.

Herçi kesen macir û Tirkêñ welat ku li rojhîlatê bêne ciwarkirin, divê bi wesîten hukumetê yêñ lezik bêne neqîlkîrin, dî dema neqîlkîrinê da xwarin û hemû mesrefê wani din, çekirina xaniyêñ wan, debara wan ê saleki, haleten çandiniyê û heywanen wan divê bi terefê hukumetê bê dayin.

Erda ku tê da macirên Türk wê bêne ciwarkirin eger dî dest Kurdan da ye û Kurd, bêyi ku wesîke ki nişandin wan bî kar tinin, divê ji wan erdan bêne derxistin û bêne vegerandin ciyê xwe yêñ berê û eger bixwazin, wê neqli rojava bin û li ciyê ku hukumet ji wan ra nişande, tê da ciwar bin. Ji bo parastina Tirkêñ ciwarkiri ji êrisen Kurdan, tevdireñ xas wê bêne stendin.

Dî sala 341 (1925) da em dikarin tenê 50 hezar nifûsi neql û ciwar bikin. Gor vê:

Ku bî temami heft miyon lire ye (2), divê ev pere tevi botçeya ciwarkirinê be ji bo sala 342 (1926). Divê macir ji bona mesrefen xaniyan, ya abori, toxim, heywan û haleten çandiniyê bêne dêndarkirin û dênenê xwe di 20 salan da bîdin.

Her usa, di deh salan da ku emê bikaribin ji Yugoslavyê, Bulgaristanê, Kafkasiyê û Adîrbacanê 500.000 nifûs binin û li mintiqeyen jorê navkiri ciwar bikin, divê ji sala 343 (1927) pê de, her sal bî kêmayı pênc milyon lire di botçeyê da bê danin.

6- Divê Wezareta Mali dest pê bike, nivsandina eraziyê berê li vê mintiqê pêk bine.

7- Wezarata Karêن Hundur, bî pereyê ku di botçeya sala 342 da hatiye danin, berê li mintiqâ Mifettişiya 5. nifûsê binivise.

8- Mînasib e ku mesrefê di rûbari serhildanê da çêbûye, ji xelkê mintiqâ serhildanê bê girtin. Bona vê yekê, divê Wezareta Mali derxistina qanûnekê bixwaze ji meclisa bîlind. Ev ji wan gundan nayê xwestin ku di vê mintiqê da ci dîgrin lê tevi serhildanê ne bûne. (Ev gund bî aliyê Erkanê Herbê Gîsti hatine nişandan).

9- Herçi kesên ku di serhildanê da ci girtine û piştgiri lê kirine, ew û xism û merivên wan û ji serokan, yêñ ku hukumet naxwaze li şerqê bîminin, ew û xism û merivên wan, divê neqlê rojava bin, ciyê ku hukumet wan ra nişan dide. Mal û eraziyê ku ew şunda dihêlin hukumet wê bikire, yan bedêle bi neqdi bide, yan ji, bî buhayê wê mal û erazi bide li ciyê neqilkiri.

“Ew serokên ku di dema serhildanê da xizmeta hukumetê kîrin û sadîq bûn” ji wan, yêñ ku tevi hukumetê diji serhildanê derketin, divê neqla wan bê tehirkirin.

10- Di nav deh salan da rêxistina eşiri gav bî gav wê bê rakîrin, xelk rasterast bî hukumetê ra bide û bistine, heqê wi bî destê hukumetê bê parastin bêyi ku yekî din navberiyê bike. Bona vê yêke, divê ji her beşeki idarê memûrên xwedi bir û baweri û jêhati bêne mintiqê û bî vi awayi, hêz û nifûza hukumetê li rojhîlatê bê xurtkirin.

Her usa, divê li vê mintiqê ji bo memûriyên de-reca duduyan û sisêyan ji memûrên Kurd tayin nebîn. Jî bo memûrên ku ji merkezê têñ tayinkirin (cendîrme ji di nav da) ev qanûna jêrin hewce ye:

A- Lî mintiqâ idara şidandi, memûrên ku ji merkezê têñ tayinkirin (cendîrme ji di nav da), heyâ ku li wir dîminin, qasi ji sedi 75'ê meaşen xwe zêde distinîn.

B- Her memûrek li vê mintiqê, di kêmayı da sê salan xizmet dike. Pişti sê salan, gor derece û sinifa xwe neqli wezifeke din dîbin li deri vê mintiqê û yekî din tê ciyê wan. Yêñ ku bixwazin dikarin di ciyê xwe da ji sê sali zêtir bîminin; lê kes nikare ji şes salan zêde bimine.

C- Di vê mintiqê da mensûbên ordiyê ji, gor nifûsa malbata xwe, qasi 1-5 tayina neferan zam distinîn.

12- Jî 4 tabûrên sinor ku li wilayetên Hekkari û Wanê ne û ji 2 tabûrên ku Erkanê Herbê Gîsti dixwest li Wanê çêbe, tûgayeke nêçirvan hat sazkirin. Bo ku hejmara van 6 tabûran û 3 tabûrên dinê ku ew ji yê sinor in û ciranê wan in, heryeki derkeve heyşt sedi, divê botçeyê da xerceke nu bê danin.

13- Çek wê bêne komkirin û gerandina çekan bê qedexekirin; tenê, ew kesên ku xwedi wesiqe bin dikarin bî xwe ra bigerinin. Çekên ku bê wesiqe bin, eger li mal bin ji disa hukumet wê dest bide ser û xwediyan wan bide dadigehêñ idara şidandi.

14- Lî merkezên wilayet û qezayêñ wek Meletye, Xarpit, Diyarbekir, Bitlis, Wan, Mûş, Ruha, Ergani, Kozat, Erdiş, Adilcevaz, Exlat, Palo, Çarsincaq, çêmisgezek, Ovacık, Husnimansûr, Bêşni, Arga (Arguvan), Hekimhan, Birecik û Çêrmikê ku aslê xwe Tîr in lê Kurdiyê zora wan bîriye, kesên ku di dairê hukumet û belediyan da û di saziyên din da, di mekteban da, di çarşı û bazarê da ji bili Tîrki zmaneki din qise bikin, bî curma paymalkirina emir û fermanêñ hukumet û belediyan têne cezakirin.

15- Lî wan ciyêñ ku eslê xwe Tîr in, lê hindîk maye bibne Kurd û li Sêrtê, Mêrdinê, Sawûrê ku ehlê xwe Erebi qise dikin, divê Ocaxêñ (komelêñ) Tîrka û mekteb bêne vekirin; xasima divê her texlit fidakari bê kîrin û bo keçikan mekteben başdırın bêne avakîrin û kar û xebatekê usa bê kîrin ku keçik hewes bikin di van mekteban da bixwinin.

Xasima, divê beri hemûyan li Dêrsim mekteben leyli bêne avakîrin û bî vi awayi xelkê vê

mîntiqê ji Kurdistiyê bê xîlaskirin.

16- Jî xelkê Dêrsim, qismê ku bixwazin jê derkevin, divê neqli rojavayê Sêvasê bin, ciyê ku hukumet ji wan ra nişande. Dî mîntiqeya mufettişiyê da, bî vi awayi, herçî kesê ku bixwazin neqli navbenda Anadoliyê bin, hukumet dikare ji wan ra ci nişande û wan neqil bike.

17- Lî wilayetên rojavaya Feratê, li mîntiqeyen ku Kurd belav bûne û tê da dijin, divê Kurdi xeberdana wan yekcar bê qedexekirin û girani bê dayin ji bo çêkirina mektebêن keçikan û jin hini xeberdâna Tirkî bin.

18- Binayên hukumetê û qereqolêن cendirmân û binayêن eskeri û qereqolêن sinoran, gor qanûna komkirina alikariyê di demeke kurt da wê bêne avakirin.

Tenê ji bo çêkirina qonaxêن hukumetê, hukumet bî xwe ji, ji botçeya giştî alikari dike. Gor imkanên heyi, divê lojmanêن memûr û zabitan ji bêñ çêkirin.

19- Lî vê mîntiqê, bernama çêkirana hemû rîyan bî aliyê mufettişya giştî tê rastkirin. Beri hemûyan, divê rîyên stratejik bêne çêkirin ku tabiyê idara ûmûmi û xûsûsi ne.

20- Divê kar û xebat bê kîrin ku şimendiferên Şerqê di demeke kurt da bîghêñ Erzinganê, Sêvas-Xarpit û Diyarbekrê; Xarpit-Çapaxçûr û Mûşê, heyâ Gola Wanê.

21- Divê hemû qereqol gor parastinê bêne çêkirin û her usa ji, bî telefon û helyosta bin. Dî vê mîntiqê da hebûna çend istasyonêñ bêtêlê (telsiz) şert e.

22- Dî warê qaçaxê, istihbaratê, casûsiyê û parastinê da, qomiserêñ sinoran, ji bili guhartinêñ eskeri yên esasi, dîkarin emîrêñ lazimbûyi ji mufettiş bistinîn.

23- Bona ku pêşî li qaçaxi bê girtin, divê Wezareta Mali çend otomobilêñ zirxi ji bistine û gava lazîm bu eskerê ser sinor ji bikaribe van otomobilan bî kar bine.

24- Lî bajarêñ mezîn û piçûk û li nehyan divê wezifê zabitan bî tevayı derbazi polêzan be û cendirme bî komîki bî karê esayışê mijûl be. Bona vê yêkê, divê Wezareta Karêñ Hundur qanûnekê

hazır bike û di botçê da gor wê guhartin çêbin.

25- Keseki yan saziyeke ecnebi, bê izna hukumetê nikare bê vê mîntiqê û li vir lêgerinekê bike.

26- Lî ciyêñ ku nîfûs hate nîvisandin, karê şandina eskeriyê wê dest pê bike. Yêñ ku dora wan hatiye, eskeriya xwe li deri mîntiqê bikin. Ev kesana bo mideteki di xîzmetêñ bê çekdari da bêne xebitandin çêtir e.

27- Lî vê mîntiqê hukumet, li hemû besen idareyê, divê karê gel rasterast bike, tucar rê û fîrsend nede kesen ku navberi dîkin.

28- Dî mîntiqâ mufettişiyê da di warê parkırına (taksimata) wilayetan da guhartin û İslahkirin, dikare bîmine heyâ qebûlkirin û rîvabırına teşkilata giştî.

24 İlân 1341 (1925)

M. Cemil

Mahmut Esa t Kazim

Mustafa Halîk Renda

Têbini

(1) Lî vur, hukumeta Turk cardin xwe rûres dike û dixwaze şorîşa Kurd wek bîyereke kevneperek nişande.

(2) Dî vê hisêbê da xeleti hene. Xeletiya pêşin ev e ku, reqemên jorin 7 milyon nakin, 4 milyon û 750 hezar dîkin. Qelema duduyan (her yek ji 250 lire deh hezar xani) du milyon û niv (2,5 milyon) dike. Qelema sisêyan ji disa nav xwe da xelet e: Eger, weki hatiye nîvisandin, debara malekê ji bo salekê 1.000 lire be, -madem hejmara malan deh hezar e- hungê, ev mesref ji ne mîlyonek, lê 10 mîlyon dike. Dibe ku bedel ne 1000, lê 100 lire be..

Helbet xeletiya "Encumenê" ne tenê ev bû; hemû hesabêñ ku wê kiri bûn ji bo helandin û nehuştuna Kurdan hemû xelet derket. Ev 67 salê ku derbaz bûn vê yêkê xwes nişan didin. Siyasetê wan ji weke arîmetika wan bû.

D A W I

L I KURDISTANÊ

PİŞESAZİYÊN

BÎCÛK

Her gel û miletik bî folklor û çanda xwe tê meydanê. Bî parastina vê rengdana jinê dikarin bijin û xwe jindar bikin. Ew folklor lî ser bîngeha abori û cîvaki û siyasi û diroki xwe dixemilîne.

Dî Kurdistanê da pişesaziyên biçûk yên destan, ciheki mezîn dî abori û jîna gel da digire.

Iro solikêن "kelaş", şal û şapîk, şutîk, gore, kum, destgork (lepik), parzûn, berîk, mehfûr, ter, merş, mezer, weris, tang, kurtan, bîvir, das, tîrpan, merr, tevir, çartılı, bî kurtahi pişesaziyên desti li Kurdistanê dî her aliyê jinê da ciheki mezîn û şundanêr heye. Lî mixabîn dewletênu ku Kurdistan dî nav xwe da beş kîrine, guh nadîne van huneran, wan




Foto: Rengin

naparêzin. Serda ji, karbîdest û burjûvayêن Türk û Ereb û Farîs bî riya berhemêن karxaneyêن xwe, bî riya bêşen giran û zordestiyêن pîrtexlit van huneran roj bî roj xîrab û betal dikin.

Çend sal berê dî bajarêن Kurdistanê da ji sûkêن (çarşiyêن) hedâdan û ji sûkêن teneke kutanê da derbaz bûn çend dijwar bû. Hîngin û

dîngîna hedâda, agîre kuçikê wan û asinê (hesin) sorê ser sindanê û asînkutan ji bira me naçe. Lî niha hedad ne mane. Eger mabin ji, kit û mit li erê û wêrê mane.

Ez dî vê nîvisê da dîxwazîm piçek behsa du pişesaziyên biçûk (sînetêن destkari) yên kurdewariyê bikim. Yek cervani û ya dînê



Mam Kemal hunermendeki jêhati ye, ev 37 sal e cervaniyê dîke. Foto: Rengin Ew ne tenê bî çêkîrinâ cerên avê, kûpêñ tîrşinê, guldankan mijûl dîbe, lê herwîsa listokan zarokan û figûrêñ heywanan ji çêdike.

lehindiksazi ye, ku herdu ji di jina me Kurdan da ciheki berbiçav hene û ketîne nav lawij û çirokêñ kelepûra me ya Kurdi.

CERVANÊ 37 SALAN

Ev camêr xelkê Tuzxurmatê ye li Kurdistanâ Başûr û ev 37 sal e cervaniyê dîke. Navê wi Kak Kemal, kurê Mam Zeynelabidin e, kurê Mam Ebasê Kakeyi ye.

Ew di sala 1931 ji dayika xwe bûye û malbata wi jina xwe bî pişesaziya cervaniyê borandiye û ew pişesazi bo Kak Kemal ji bav û bapirêñ wi maye û ew ji bî serfirazi evi karê xwe dîdomine û niha digel kurên xwe dixebite.

Berhemên ku ew çedikin gelek bedew, rind û qehim in; bî neqîş û renga reng xemili ne û zehf balkêş in. Mam Kemal li Tuxurmatê

pêşangeheke (raxistin) bedew ji berhemên renca xwe daniye. Mam Kemal her niha ji cerên avê, dizikên rûn û penir, yên tîrşinê, cêrên gul û çiçeka, bo xwarîna avê (kûpê avê), şerbikên avê, oman û kevçikên renga reng; her usa ji tiştikên zarokan wek şêr, pîling, fil, xezal, berx, masi, hesp û gelek timsalên (heykelên) rengin çêdike.

Berhemên Mam Kêmal bî nav û deng in û iro ji baş têne firotinê.

HUNERMENDEKİ GEL

Sinetkareki dîn ê Kurd, Kak Mihemedê kurê Seyid Brahimê Kakeyi ye. Kak

Mihemed di sala 1952 da li bajarê Babe-gurgur (Kerkükê) hatiye dînyayê. Jî malbateke hunurmend e ku bî dartraşiyê mijûl e. Wi ev huner jî bavê xwe hin bûye û niha jî dîdomine.


Kak Mihemed vân tiştên xwarê çedike:

Sindoq, ku berê dî hemû malên Kurdan da hebû û niha jî lî gelek malan heye.. Xasîma bo cihêzên bûkan sindoqên dara gûzê dikirin û keç û bûkan wan sindoqan bî hune-rêñ xwe yên bedew dixemilandin.

Sindoqên biçûk, yan ji "bahol" jî bo kesên ku dicûne xeribiyê, yan ji lî nav malê tiştên taybeti tê da datanin.

Hêvcar û xencerâ

genim kutanê (gam) û şexre, qızınax (çap), niveqızıñax (nivçap) (ji bo pivana genim dihate çekirin). Merr û betirik û bêlik, destikêñ kerik, bîvir, tîrpan û çakûç, şeqil (mohîra jî bo genimê coxine ye, di dema axa û erbaban da hebû, niha nine).



Kak Mihemedê Seyid Brahim xelkê Kerkukê. Foto: Rengin

Lehîndikêñ mezîn (dergûş) û biçûk bo zarokan. Şekîrdank, mirkut, teşî û şehê hîriyê û darbest, tabût, textê nîvistinê (razanê), mase û rûniştok (kursi, sendelye), bufe, qenepe, dolav û kitêbxane, sêpeka zarokan û pîne (textê nan lî ser pahn-kırinê), mezirke û tir û werden û hwî...

Kak Mihemed jî bo evi karê xwe yê hêja û piroz û yadigarê bavê xwe di

şîreke xwe da weha dîbêje:

"Mîn dartaşêk im Kurde-ki hejar
Xeriki kar im beyan ta êvar
Bo xizmet kirdin
Kurdistanekem
Fida ye giyan û hem û malekem."

Mîn dartaşêk im bê kes û hejar
Herdem kar dîkem li koçeyi bazar
Be rençi şani xom, nan peyda dîkem
Bo niştiman giyan fida dîkem."

NEWROZ

Têbini: Agahdari û wêneyêñ nîvisê, ji kovara Rengin (Rengin, hejmar 40-43, sal 1992.)



Nivisara jîrîn ji pirtûka "Diroka Dinyayê 1" hatiye wergerandî. Pirtûk bi zimane danimarkî hatiye nivisandin û orijinal navê wê "Verdens Historien 1" (Diroka Cihâne 1) e. Ew ji ali cend kesan va, bi xebateke kollektîv hatiye amadekirûl Niviskaren pirtûke Dr. N. H. Bang, Dr. Fridtjuv Berg, Mûdurê Dibistana Geleri (Folkeskoleinspektör) Ingvor Bondesen û Nordahl Rolfsen in. Pirtûk ji ali "Pirtûkxana Gyldendal", li Danimarkaya hatiye capkîrm.

BAWERIYA KEVN A PERSAN (*)

1- AVESTA

Wergêr: Y. Çakmak - A. Gernas

Ji nivisarên pirtûkên piroz ên Persên kevn ra "Zend Avesta" yan ji tenê "Avesta" tê gotin. Avesta ji ali mezînahî va, ji "Wesiyetnameya Kevn" hînek piçûktır e. Ayet an ji nivisarên heri gîring û piroz, Gathay-ên pêxember û nûjenkar Zerdeşt in. Gatha yan ji kurtenîvisên Zerdeşt (Zarathustra- Zoroaster)- B.Z. 700 ji 17 stranan pêk tê. Dî van stranên ilahi û nûjenbar da, Ahûra Mazda wek Xwedayê yekta û rast tê pesinandin. Zerdeşt, xwe wek elçiyê Xwedê yê bajarti bînav dîke û xwe wisa dide nasin ku, ew ji bo guhurandina dinê insanan û serketîna hakîmiyeta Xwedê hatiye dinê. Ew (Zerdeşt) wek pêxemberek hereket dîke, ji bo hilbijartîna rihê pak û ne-


pak rê nişan dîde. Ew, xwe dîke pêşewayê wi dinê nû, dinê ku ji yên berê, ji yên pirxwadayi bilindtir û cidditîr e, ji bo jiyaneki paqîj û kıryarêñ baş e, ango ne dineke ku tenê di dema qurbanan da tê perestin!

Dî besên dîn ên Avesta da, pûtperestiya ecêb a ku Zerdeşt li hember têkoşin daye, tê pêş. Ev pûtperesti dî pirtûka qanûn ê Avesta da, dî nivisarên piroz ku dî dema qurbanan da tê gotin, zêdetirin ji dî nivisarên qanûn ku Zerdeşt ji bo Xwedayê cuda gotiye da heye. Gotarêñ qanûni yên weha, bî wazên Ahûra Mazda ra, ango yekta Xwedayê ku ji ali Zerdeşt va hatiye êlan kîrin, dîkevin hevrîkiyê. Pişti mîrina Zerdeşt ji, van nivisaran dî nav nivisarên piroz

da cih digrin, û ev ji dide xuyan ku pütpurusti ji bini ranebûye yan ji wînda nebûye. Pişti mîrina pêxember (zerdeş), pütpurusti car din seri rakir, lê vê carê gotarêñ Gatha li gor rihê dinê nû hatin amadekirin. Ü divê em bî awayaki kûfxweş bibin ku, dinê kevn ji tevayi wînda nebû. Lewra aliye balkêş ê vi dinê geli, heta roja iroyin parastina wi ye. Lê werin em ji dema heri kevn dest pê kin û niha gotarêñ stranêñ reformbar ên Zerdeş deynin aliki.

Dî vi dinê kevn da tiştê heri balkêş, bî awayeki ecêb şirovekirina sıruştê ye. Dî baweriya van gelên kevn da, di hemû tiştan da ya paki yan ji nepaki, jiyan û daxwazi, jiyan yan ji mîrin heye. Hemû tiştêñ ku ji bo jiyanê ihtiyaciya me pê heye ev in: berên axê, heywanêñ goman, av, hewa, tiştêñ piroz û xwedayı ku me ji tiştêñ xîrab û wêranker, ji mexlûqên mîrinê, tiştêñ xîrab ên pişti jiyanê dîparêzin û alikari dikin. Dî navbera parêzkarêñ jiyanê û insanan da merivatiyek vekiri heye. Heri tiştê baş ku meriv dikare bike, heta ji destê meriv bê, parastina van tiştan, pêşvebirina wan û şakırına wan e. Ev ola wi ye. Li dînyayê wê jiyan bête zêdekîrin û xurtkîrin.

Nîvisarek AVESTA weha dest pê dike: "Afîrandêrê dînyayê, mirê jiyanê! ax li kuderê xwe zêdetirin şabûyi his dike?" Ahura Mazda weha bersiv dide: "Cihê ku ax xwe zêdetirin şabûyi his dike, cihê ku kesê bêdad ji xwe ra xani çêdike, ocaxa malbatê şen dike, heywan xwedi dike, dibe xwedi malbat, dî malê da hebûna wi heye, hebûb, giha û darêñ mîweyan tê çandîn, axa ziwa tê avdan û axa avi tê ziwakîrin e. Lewra" dibêje Ahura Mazda, "erdê neajoti û neçandi, wek jîna bedew û ciwan e ku ji xwe ra mîr û zarok dixwaze." Jî ber vê yekê ajotin û çandîna erd, zêdekîrîna zêdekîrîna bereketa wi û bî wi awayi şakırına wi, wezifeyek dîni ya sıruştî ye. Gava yek axê bajô, bî hebûn û şahi li serê bijî,



Zerdeş

Wêne: ji kîvara Mizgin

doza jiyanê ya dînyayê xurt dibe, li hember hêzên nepak ên mîrinê Xwedê xurt dibin. Jî ber vê yekê em hînek din ji dixwinin û berdewam dikin: "Afîrandêrê dînyayê, mirê jiyanê! dinê MAZDA çawa tê firehkîrin û xurtkîrin?" Ahura Mazda bersiv dide: "Bî xiretkêsi, bî daxwaz çandîna hebûb (genim, ceh ûwd.) e" û lê tê zêdekîrin: "Kesê ku çandîniya hebûb dike him serûberi dike jiyanê, him ji dinê MAZDA bî qeweta 100 mîran, bî qeweta xwedîkar a 1000 jinan, bî bandora 10.000 qurbanan xurt dike û xwedi dike. Gava hebûb tê çandîn, şeytan xof digrin; dema ku kulîk dîdin, dilêñ wan (şeytan) dîricife, gava şin dibin, şeytan digrin û gava hebûb dîserîdin, şeytan direvin. Dî mala ku hebûb tê da tûne be, şeytan lê rûdînêñ; lê cihêñ ku hebûb lê zêde bin, gewriya şeytan wek hesinê ji agîr sorbûyi ye."

Ev, imaneyâ xeberdanêñ AVESTA ye. Tiştêñ ku jiyanê xwedi dikin û jê ra xîzmetê dikin, xîzmeta doza MAZDA dikin, hakîmiyeta Xwedê fireh dikin û pêşda dibin. Ev, dî têkoşîna li

hember dijminê mezin da, li hember mîrinê, ku dî destê şeytan da çekê heri mezin e, alikarîyê dike. Sîruşta baş û insan dest didin hev û bî hevra xebatê dikin, alikariya hev dikin - wek ajotin û çandina axê- û jî ber vê yekê ye ku, ajotin û çandina erd wezifeyek dini ye. Ev din, dî şerê navbera hêzên mîrin û jiyanê da, jî piştgiriya jiyanê pêştir tiştek nine.

Axa bî xêr û bêr a dînyayê ya ku destûr dîde insan û heywanan da ku li serê bijin, xîzmeta jiyanê dike, hevalbendê xebatê yê MAZDA ye. Û ew, li gor ramanêñ MAZDA piroz e. Eger neajotina erd, bî mebesta ku qeweta jiyanê qels dîbe, guneh be, hevtêkiliya axê û dijminê sereke mîrinê, jê gunehtr e. Divê tucar cendekek di axê da neyê veşartin, "ax ditürse" dîbêje AVESTA. Cendek nedîhatin şewitandin ji, lewra agir ji piroz bû; agir û jiyan parçeyen hev in û jî hev nayêñ veqetandin. Li gor binavkirinê, MAZDA -Xwedayê jiyanê- ji hemû tişten dînyayê bî tenê **agir** wek "kurê xwe" dipejirine, didema (tabloya) rasteqin qebûl dike. Cendekîn insanan, li derva dîhatin raxistin da ku teyrêñ goştxur wana bixwin. Jî bo cendekan qûleyen veşartinê yêñ gilover û fireh, hema bêje wek bîrcêñ kelehan gilover, dîhatin çêkirin. Cendek li derva, li ser rûniştekên dîrêj, ku wek bank bûn, ên amfitiyatroyan dîhatin raxistin: Cendekê zilaman li cihêñ heri bîlind, ên jina di nivekê da, yê zarokan ji li ser rûniştekên heri jêrin dîhatin raxistin. Wê hîngê teyrêñ goştxur dikaribûn bîhatana û wan cendekan bixwarana. Dîgel viya, piştî ku baranê pisi û qirêja cendekan ên bermahi li niveka avahiyê dîcivand, ew şîlbûn baş dîhate werivandin û jî pisiyêñ bermahi dîhate paqîjkirin û her weha dîghihişt qatêñ heri kûr ên axê. Axa ku dî xîzmeta jiyanê da bû, gerek bî tu awayi bî tişten ku dî cendekan geriyane ra neketa têkiliyê (temasê) û ne-hata qels kîrin.

Jî ber ku av ji, xîzmeta şînbûna zeviyan û hebûban dikir, dî seri da ji çem û avêñ kaniderkan, hevalbendê xebatê yêñ MAZDA bûn, lewra ew ji li dînyayê xîzmetkarêñ jiyanê ne. Av û dar û ber tim wek jîndarêñ piroz têñ bî nav kîrin. Jî avê, tenê jiyan dertê. Helbet li wê derê, li ser mîrinâ ku ji fetisandinê çêdibe hatiye fikirandin, lewra li vê derê av, wek tişteki ku jê mîrin çêdibe tê xuyan. Derbari vê mijarê da dî AVESTA da weha dîniwîse: "Afirandêrê dînyayê, mirê jiyanê! av dîkare bikuje?" MAZDA bersiv dîde: "Na, yê ku dikuje ne av e, şeytanê mîrinê ye ku insana girêdide û bî xwe ra dîbe; av, tenê wi dike nav dergûşa xwe, berbi jêr û jor dihejine, davêje qerex û her weha teyr têñ û wi dixwin." Ango av, dî fetisandinâ kesê mîri da jî bîni bêsûc e.



Ahura Mazda

(Wêne: ji Tarixa Kurdistan- Cigerxwin)

Baweriya gelê AVESTA ya bingehin, bî gîsti xurtbûna hêzên jiyanê bû li hember hêzên mîrinê. Jî ber vê yekê, qabiliyeta avê hebû da ku zor bîde hêzên nepak û wan bîde revandinê. Li gor olêñ kevn, cihêñ ku av lê dîpeşkile, cinêñ mîrinê, ango reva şeytanân, baweriyeke normal ê jî rîzê ye. Dî olêñ ku heta dirokêñ heri kevn ên ku êm jê agahdar in da, meriv rasti bikaranina "ava piroz"




Fig. 35. Kapitæl fra Susa.

Rûpelek ji pirtûka "Diroka Dinyayê-1




Fig. 36. Forhallen til Xerxes I:s Kongeborg i Persepolis.

Ji pirtûka wergerendi

dibe; lewra yê ku jindarên bas diparêze û beri şeytan an ji cinan dide her ava piroz e. AVESTA, derheqa ew ava piroz û paqîj a ku wek "ava piroz" tê bî kar anin gelek minak dide. Eger cismek miri bî hebûban ra ketîbe têkiliyê, wê gavê rihê mirinê dî hebûban da imkana têgerinê û işgalkırinê dîbinin, ya xwedikari û jindariya hebûban qels dîke yan ji jî bini dikuje û qeweta nan û têrkariya wi wînda dîke. Lî herdem û lî her der, bî saya peşkilandina avê, ango çavkaniya jiyanê, cardin nan dikare bîbe xurekeke xwedikar û bigihije wê qewetê. Av, tenê bî temasê beri şeytan an dide û cardin cism dîke binê hukmê xwe û jî nû va wi dixe xizmeta jiyanê. Ev bûyer, wek ku hemû olên kevn behs dîkin, bî avê "paqîjbûn" e; "pisiti" bî riya cendek an ji terma li cism geriyaye û ew jî rihê dijmin ê şeytan an bêhejmar pêstir tiştek nine.

Dî AVESTA da derbari paqîjbûn, ango rizgarbûna insanê ku ketine

bin hukmê şeytan an mirinê, agahdariyên gelek vekiri û esehi hene. Bî ser van insan an da ava piroz tê peşkilandin û her weha tên paqîj kîrin. Piştî gelek hazırlayan, merasim (seremoni) dest pê dîke û "avên baş" bî ser seriyan da tê peşkilandin. Av, jî jora seri şeytan dide revandin, lê şeytan xwe jî navbera herdu brûyan dûr nake. Piştîne di navbera herdu brûyan da av tê peşkilandin, wê çaxê şeytan direve paşıya seri. Av bî ser paşıya seri da tû peşkilandin, lê vê carê şeytan dîkeve çene. Dû ra av, lî çene, jî çene heta guhê rastê, jî guhê rastê heta guhê çepê, jî wê derê bî ser gurmilkêñ rast û çepê, û jî wê derê jî bî ser hemû laşê insan tê peşkilandin.

Rihê mirinê yê neşabûyi hêj ji jî avê, jî ava jiyanê, direve lewra dî vê têkoşinê da yê heri xurt av e. Dî dawiyê da şeytan direve û dîkeve paniya piyê çepê, û lî wê derê wek kermêşeki vize viza wi tê bîhistin. Meriv pani radike û dadiweşine, vê carê şeytan dîkeve serê pêçiya mezîn. Pêçiya seri ji tê dawesandin û her weha paqîjbûn temam dibe; û ew kermêşa qebih ê reş, zalmê xirab, jî laş dertê, çokêñ wi berbi pêş şikandi û bî dûvê xwe yê repbûyi berbi cehenemê, ango berbi cihê ku layiq e direve.

Lî gor rawekirina AVESTA, lî dînyaya mezîn hemû mexlûqêñ afirandi, dî şerê navbera mirin û jiyanê da cih dîgrin. Dema ku Xwedayê rojê Mithra tevi hemû hêzên xwe yê çekdar jî perê ezman derbas dibe, dijminêñ xwe ango hêzên mirinê mexlûb dîke; lî gor gotinê av û dar û ber ji dî nav hêzên wi bawermend a cih dîgrin; ew (av û darûber) çaralî dora Mithra dîgrin, bî çekêñ gelek qewi wi diparêzin. Wek ku tê gotin, dî dema bûyina Zerdeşt û mezinbûna wi da, av û darûber kêfxweş bûne û dûra jî axê piyiqine; hemû ruhberen baş vê bûyurê piroz kîrine: "Jî bo me bûyina Zerdeşt -insanê fedakar- çi kêfxweşîyeke mezîn e, ku ew ê dinê MAZDA lî heft qatêñ dînyayê belav bîke."

Balkêş e ku, li dû hev bang li hemû ruhberan tê kîrîn û tên pesinandin, ango yê ku dihate pesinandin ne afirandêr bû, yên afirandi bûn, hêzên dînyayê yên xwedayı yên ku hevalbendiya jiyanê hilbijartibûn. Mazda jî Zerdeşt ra dîbêje: "Zerdeşt! hemû ruhberen ku min afirandiye wek ruhberen xwe bî nav bîke" û afirandiyê Zerdeşt weha tên bî nav kîrîn: **Axa Piroz, Ava Piroz, Dara Piroz, Deryaya Ezman û Ezman** bixwe û **Xaniyê Kainatê** yê bêdawi yê ku wi rohni dîke. Piştî duayênu ku jî Mazda û ruhêni wi ra tên kîrîn, em gelek caran rasti viya tên: "Afirandiyênu ruhi û cîsmi yên Xwedê!" Yênu ku baweri bî dinê Mazda anine, dî her tiştî da irade û afirandêriya Xwedê dîbinin, ku ev tişt xizmeta daxwaziya Mazda dîke û ew ji, li hember mîrinê serketina jiyanê ye.

Em eyni ramani dî baweriya AVES-TA da ji gelek kurt û vekiri dîbinin. Ev, vekiri û rasterast dest pê dîke: "Ez şeytan qebûl nakîm û wana red dîkim. Ez xwe wek perestkareki Mazda, mûridê Zerdeşt, dijminê şeytan, piştgûrê qanûnêna Mazda itiraf dîkim û pê iman tinim." (sonda bawermen-dêna Mazda û Zerdeşt-N.W) Ev sond li pêş weha berdewam dîke: "Ew parti (partiya jiyanê), partiya ku avê ji pê iman aniye, darûber û ga pê iman aniye, afirandêre insanê bî dad û ga Ahura Mazda pê iman aniye, partiya ku Zerdeşt û merivêni piroz hilbijartiye, wê bîbe parti û yasayêni min." Ev tê vi maneyê: Hemû afirandiyêna baş, Xwedê bî xwe, dî têkoşina mezîn a dînyayê da li hember mîrinê hevalbendiya jiyanê hilbijartîne; ez ji dixwazîm bîbîm yek ji wan; ez dixwazîm xebata xwe ji tevi xebata wan a pêşdebîrin û firehkîrîna jiyanê bîkim.

Ev ol, li dînyayê dî jiyan û hemû tiştîn ku jiyanê didîn da hebûna xwedayıyek fêr dîke. Aşkera ye ku ev ol, reva ji jiyanâ dînyayê û xwe-hepiskirînê dî perestgeheki da yan ji

jiyanek xizani xweş nabine û napejirine. Bêbaweriya heri mezîn, birçi hiştîna bedena insan, tade lêkîrin, kesîrandîn û bî vi awayi xerakırîna beden e. Divê her insan û hemû silsila wi, bî domandîna jiyanek bî sihet û serxwe hukmê xwe bilind û zêde bîke. "Ez, Ahura Mazda, êlan dîkim ku, merivêni zewicandi ji yên nezewicandi, merivêni bî mal (xani) jî yên bêmal, yên xwedi kur ji yên bêwar, merivêni dewlemend ji yên xîzan qedîrbilindît e." Hukumdar-ki Persi yê ku P.I. (Piştî Isa) 500 sali da jiyaye û baweri bî Mazda aniye, ji van baweriyyê filehiyê: pesinandinâ mirinê û biçükxîstîna jiyanê, dêlva biberiya insan pesinandinâ bêberiya wi, acîz dîbe û weha dîbêje: "eger meriv li gor vê baweriyyê hereket bîke, ew ê di demek nêz da dawiya dînyayê bê."


Ev dinê Persiyan ê kevn, dineki jê-hati, jiyandagirti, bî sihet û quđret bû. Eger ew, tenê li ser didema bedeni û ya ku jî derva tê xuyan bifî-kiriyana, ev din wê wan berbi bêtedbîriyê bîkışanda, lewra ji wîsa nekirin.

(*):

Bi vê sernîwisa lêkolîna xwe niviskarêne pirtükê, wîsa dane xuyan, mina ku dîni Zerdeşt tenê yê farisan e. Çawa tê zanîn gelek orientalisten ku di sedsala 18'an da lêkolînen weha çêkirine, gelek caran kurd li dervayî hesab hiştîne an ji ew li ser gelên ciran jimartine. Ev kevneşopiya han mixabin nuha ji gelek caran derdikeve pêş me.

Helbet ev kîmasiyeke lêkolîne ye. Qet nebe dî şûna farisan da bigotana İranî disan ji wê rasttir bûya. Lî ji ber ku ev xebata derheqa bir û baweriyyê dinê zerdeşti da agahdariyêne fire dîde; hêjayi wergerandin û weşandinêye.

İro êdi ne tenê kurd bî xwe, her wîsa gelek dirokzanen cihanê ravadîkin ku Zerdeşt kurdeki "Medi" ye, ji eşîra "Magî", xelkê Belxê ye û zimanê pirtûka wi "Avesta" zimanê medi ye.



Zordesti û êrişên dewleta türk li hember weşanêñ kurdi her diçe dijwartir dibe. Bi kuştina rojnamevanan, komkorina weşanen, bîrrina cezayêñ giran yêñ zindan û peran, dewleta türk dixwaze yekser rê li ber weşanêñ kurdi bigre û gelê me bêdeng bîhêle.

Lewma divê mirovêñ welatparêz û xwedi xiret diji zordestiya dewleta nîjadperest û kolonyalist, destê alikari û piştgiriyyê dirêji weşanêñ kurdi bikin, wan bi tenê nehêlin.

Kovara Roja Nû digel. Dengê KOMKAR û Infomationsbulletin Kurdistan, ji raya giştî ya dervayı welat ra bangeke piştgiriyyê belavkirin. Bang, bî zimanê ingilizi, almani û swêdi, bî awaki fireh hatiye belavkirin. Em kurdîya wê ji li vir pêşkêsi xwendevanêñ xwe dikin.

Redaksiyona Roja Nû

Bang

PIŞTGIRİYA ÇAPEMENİYA KURDİ YA ZORLÊKİRİ BIKIN!

Ji çapemeniyê,
Sazgehêñ navnetewi,
Partiyêñ siyasi û
Ronakbiran ra

Parçê heri mezin yê Kurdistan'a
dabeşkiri dî nav sinorê Tîrkiyê da ye û
lî vi parçı 15 milyon kurd dijin.

Ev gel dî bin zordestiyeke giran da
ye, ji mafêñ xwe yêñ netewi û demokratik
bêpar hatiye hiştin. Ew nikare
komeleyêñ demokratik û partiyêñ
siyasi ji ava bike.

Gelê kurd xwedyî dirok û zimaneki
kevn, kultureke zengin e. Lê ev kultu-
reke qedexe ye. Dî Tîrkiyê da ji gelê
kurd ra perwerdegariya bî zimanê kur-
di qedexeye. Dibistanêñ kurdan tu-
nene. Bi zimanê kurdi weşandina pro-
gramêñ radyo û televizyonê, xebata
çap û weşanê qedexe ye.

Bi saya berxwedana gelê kurd û
piştgiriya navnetewi, van du salêñ
dawiyê dî çembera zordestiya ser
zimanê kurdi da hîn qul vebûne. Roj-
nameya hefteyi AZADI dest bî jiyana

weşanê kîr. Hîn kovar û rojnameyên kurdi derdikevin û li ser ziman û çanda kurdi hîn pirtûk tê çapkîrin. Lî belê li ser vana zordestiyeke gîran heye ku dike wan bifetisine.

Mesela ji ber ku DENG'ê , kovara mehane ya ku pîrsa kurdi niqaş dike, di hejmarêne xwe yên 17 û 18'an da hevpeyvineke digel siyasetvaneki kurd, serokê Partiya Sosyalist a Kurdistanê Kemal Burkay weşandiye, nuha berpîrsiyarê wê yê giştî Kamil Ermiş, ji ali DGM'a (Dadgeha Emni ya Dewletê) ve tê mehkemekîrin û jê ra du sal cezayê girtigehê û herwisa 200 milyon Lirayê Tîrki (lî dor 25. 000 dolar) cezayê dîravi tê xwestin.

Ev şeş meh in, bî navê AZADÎ rojnameyeke hefteyi, bî kurdi û tîrki tê weşandin. Gelek hejmarêne wê ji ali polês va hatin komkîrin. Mesela di meha mijdarê da hejmarêne wê 25, 27, 28 û 29 ji ber hîn nûçe, miqale û ropor-tajen çapkiri hatin berhevkirin û ji ber hindê ji ji xwedi û berpîrsiyarêne wê ra cezayên hepsê û yên pereyêne gîran tê xwastin.

Weşanger Mehmet Bayrak, ji ber ku biranînêne ronakbireki kurd-ku li surgûnê miriye-, wek pirtûk weşandiye, ji ali Dadgeha Ewlekari ya Dewletê li Anqerê jê ra 100 milyon LT. (Lirayê tîrki) cezayê dîravi bîryar kîr.

Daweyêne weha ku li diji weşanan û weşangeran tê vekirin; bîryarêne komkîrin û cezakîrinê gelek in.

Ev çend meh in ku bî tehdid û zordesti mecalê belavkirina AZADÎ û hîn rojnameyên din wek Yeni Ülke û Özgür Gündem tê astengkirin.

Dî nav sala dawin da 13 rojnamevan hatin kuştin. Yek ji van Musa Anter'ê 75 sali bû. Failê van cinayetan qet yek ji heta nuha nehatiye girtî; ji ber ku ev cinayet bî destê rîxistinêne terorê dîqewimîn ku dewleta tîrki piştgiriya wan dike.

Bî vi awayi dewleta tîrki ji aliyeki va ji

bona ku xwe rûsîpi nişan bîde, mesajê dide raya giştî ya dînyayê weki çapemeniya kurdi serbest e, û li aliyê din ji, hemû şêweyêne teror û zordestiye bî kar tîne bona ku çapemeniya kurdi ji ali abori va bifetisine, bî fiziki dengê wê bibire, û nehêle ew bigihê destê xwendevanan.

Bêşik di şertêne weha gîran da şansê berdewambûn û jiyina çapemeniyê tune. Û eger iro ev weşan hebûna xwe berdewam dikin ji, ev yek tenê bî saya xiretkêsi û fedekariya ronakbirêne kurd û gelê kurd pêk tê.

Aha ji ber van sedeman, em, beşeki çapemeniya kurdi lî dervayi welat, bangi we dikin ku hûn lî hember zordestiye hov û paşverû ya dewleta tîrki, piştgiriya rojnama Azadi û tevaya çapemeniya kurdi bikin.

Hûn dikarin bî gelek awayen cuda piştgiriya çapemeniya kurdi û gelê kurd bikin: Mesela bî aşkerekirin û belavkirina agahdariyêne ser van zordestiyan; bî protestokirina hukumata tîrki bî awayen pêwist û herwisa piştgiriya wan kes û rîxistinêne bikin yên ku dixwazin pîrsa kurdi têxîn nav rojeva sazgehêne navnetewi.

Wek her geleki mafê gelê kurd ji heye ku di welatê xwe da azad biji. Divê zimanê kurdi û çanda kurdi ji azad bîbe.

Bî rîz û hurmetan ve.

10.12.1992

Rojâ Nû

Kovara kurdi a çandi
Swêd

DENGÊ KOMKAR

(Rojnameya mehane)
Kurdi- tîrki
Almanya Federal

INFORMATIONSBULLETIN KURDISTAN

Almani
Almanya Federal

Şekirnevatfıros

Welli Mendesori

Dî hêna xortaniya xwe da mîn ber devê çemê Kur'ê-lı Tibilisê bî firotina şekirnevata kar dikir. Erebeke mîn hebû, bî sê tegerekân. Mînê şekirnevata xwe tê da bî ci bikira û dî navbera heyatê ber devê çemê Kur'ê ereba xwe bîgeranda. Rîsqê mîn, xwarîna mîn lî ser vi kari bû û ez jî jiyana xwe razi bûm. Kêmaniya xebata mîn, her tenê ew bû ku ew xebateke wedeli bû. Havinê, çaxa şekirnevât pir e û baş tê firotin, jî xebatdaran ra gelek xebatkar pêwist in. Û jî ber vê yekê, lî payizê û zivîstanê jî mîn ra "demeke mirî" bû, jî bo ku şekirnevât nedîhate firotin. Mîn xwe ra xebateke barkêşiyê bî dest dixist û heya havinê bî wi kari ebûra xwe dikir.

Xulese, ez jî jiyana xwe razi bûm. Mîn hînek dirav ji berhev kîribû û lî ba dayika xwe veşartibû... Mîn karê xwe yê zewacê dikir. Lî merema mîn a zewacê nedîgiha miyeserbûna xwe. Dayika mîn çend qiz nişani mîn kîribû, lî qet yek jî bî mîn xweş nedîhatibû. Û qizên ku dayika mîn behs dikir, hemû jî malêñ dewletiya bûn. Ew ji peyi wê yekê ketibû, peyi hebûna wan, ne ku peyi merifet û dilê qizê.. Û jî bo vê pîrsê ez û dê , tim hevra diketine hucetê û rîkê. Lî dayika mîn, jîneke ne serwext bû, bî rîk û eynat bû, ya xwe dikir. Jî bo xeysiyeta wê ez lê-lê bûm jî mal bîreviyama. Ewê , bî xeyseta xwe usa kîr, ku bavê mîn terka malê da, çû jîneke din stand... lî wextê ewê texmin

dîkir, ku ez dîqehîrim, hêrsa xwe radîkîm, zûkava xwe gunê dikir, dîgot: - "Qutoyê mîn , xîn jî te xweyê mîn kes tune. Ez li feqirtiya xwe dînihêrim acîz dîbîm, ne ku jî bûkê.

Çî mîn ra ye bedewbûna wê, xwe ne gustilkazêr e têkime tiliya xwe. Seri ew e ku hebûna dê û bavê wê hebe, ku cihêzên bîha û baş pê ra dayinin û me ra jî, idi kîrina hûr-mûrêñ dîn pêwist nebîn..." *Sayîla*

Ez nîzanim heya kengê, wê şerê mîn û diya mîn dirêj bûya, eger mîn Gulê nedîta.

Gulê keçêke xas û bejnbilind bû. Çav-bîrûyêñ wê reş bûn. Ew geleki xweşik û xwinşîrin bû. Lî ser sûretê wê yê sıpi da du xalêñ zer ci girtibûn.

... Ew bû gula dilê mîn.

Gulê ji, weke mîn, qiza feqiran bû. Ewê jî bî paqijandîna malêñ dewlemen-dêñ gurcan ebûra xwe dikir. Paşı mîrnâ dê û bavê Gulê, bîrayê wê yê neqenc, bî serkariya jînê beri dabûn ew jî mal qewitandibûn. Wê jî xwe ra odeke bîçûk kîrê kîrbû li taxeke Tbilisê ya kevn û lî wir dîma.

Mîn gelek "gili-gotin diavêtine" ber Gulê, pê ra dikire henek û laqîrdi. Bî çavan ew dîda serwextkirin, ku dilê mîn wê da heye. Mîn şekirnevât bê heq dîda wê, lî mîn newêribû jê ra bigota ku ew hîzkiriya mîn e.

Lî rojekê, mîn teyax nekîr û gotê:

- Gulê ez dixwazim ku ez û tu bize-wicin. Tu dixwazi bîbi kulfeta min?

We gereke bîdita, Gulê çawa şâ bû. Reng lê çû, ji şerma sor bû, li hev ket sor bû û got:

- Erê Quto dixwazim.

... Ez geleki kêfxweş bûm, ji bîhistina navê xwe, xasma bî zarê wê yê nazik. Min li dor-berê xwe nîhêri, dit kes tune, destê xwe bire sûretê wê û carekê sûretê wê yê sor û germbûyi maç kîr.

Wextê em ji hevdu vejetiyan, lingên min erd nedigirt. Min tirê niha, per û baskên min derên ez ê bifirim ezmana.

Dû firotina xurekê, ez leze-lez, bî dileki şâ çûme mal, da ku mîzgîniki xêrê bîdime dayika xwe. Lî wexta min bî şayi li wê kîr qêrin "Dayê ez dîzewicim!", wê qet nexwast ez guhdari bikirama. Dest pê kîr; bî qêrin, qûjin, girin;

- Te çi got?! Bê cihêz?! Belengaz û bê xweyi?.. Tu dixwazi weki ez bîmirim erê? Quto bêje! Tu dixwazi ez bîmirim û herim erê ?!... Wey Xudê! Min çi gunekari kiriye te kureki usayı dîlkevir da min... Kurê ku dixwaze diya wi zû bîmire! Ew mirina dê dixwaze Xudêê!

Her tenê ew mabû, ku ez ji malê derketama û deri li peyi xwe bigirta.

Jî wir şûnda, ez berbi mala dê neçûme.

Min û Gulê, dî oda wê ya kîrekiri da, li ba hev, jîyanekî nû dest pê kîr...

Me geleki hevdu hiz dikir û jiyana me geleki xweş derbas dibû. Em pîr baş ji hev serwext dibûn û bengi bibûn ser hev. Evina me roj bî roj germ û bîlind dibû. Me nikaribû em du deqîqa bê hevdu bîminin. Eger Gulê ji xebata xwe dereng vege riya, ez hîngê dîfikirim, li ber xwe dîketim, rehetiya xwe wînda dikir. Xulese, min ji Gula xwe usa hiz dikir ku êdi hishê serê xwe unda kîribû... Ê bî rasti ji Gulê hêjayi

hîzkîrineke weha bû.

Her tişt baş bû, heta ku meheki şûnda delala min hate guhastin. Usa ku min ew nas nedikir. Ewê dest ber xwe dani. Min dest bî kumreşî û şikan kîr, dîketime fîkarêñ kûr, min ji xwe dîpîrsi; gelo dîbe ku Gulê êdi ji min hiz nake?..

Ez, bî xeysiyyetê xwe va yeki binteng û ümgiran im, wek bavê min, dîbe ku Gulê ji ber vê ji min aciz bûye?..

Ü paşı van derdikîşandînan ez diha û diha kûvi dibûm ji hîzkîriya xwe. Minê gîlik û dudu bigota, zêde kesi ji min xebet nedibîhist.

Rojekê Gulê geleki derengi bû. Ez li benda wê mam. Dî xwe da dîqîçqîcim. Cîxare, yek dû yekê dîkîşand. Min xwe ra dîgot; gelo çi hate serê Gulê? Çi qewimi? Bo çi derengi dîbe? Dî dinê da hezar qezi û bela hene... Lî seheta deha derbaztir, êvarê çawa bû, Gula min hat.

Ez şâ bûm, bîna min fire bû, ku Gulê sax silamet e. Hêrsa min zûkava dani û derdêñ min ji deqekê da unda bûn. Lî dîlê min ne rehet bû, ji ber ku rengê Gulê, kîfa wê li min xweş nehat.

- Gulê tu çîra usa derengi bûye? -min jê pîrsi.

- Bêje heta kengê tu wê tev qaba biji? wê ji dî aliyê xwe da pîrseke weha da min, bî hêrs.

Ez mam ecêbmayi. Min nîzanibû çi bersiv bîda.

- Gulê min serwext ke, çi bî te dîqewime? Çi bûye? Tu cîma wa hati guhastin?

- Tiştak bî serê min neqewimiye! Eva meheke dayika te ez rûreş kîrime, rehetiyê nade min. Tê ciyê xebata min, li wir dî nav xelkê da min dîke qaba kuçan. Navê min xîrab dîke. Min dîde şermê. İro ji cîmaet li serê min kom kîr û dikir qêrin;

- Evê qabê evê neqencê, kur ji min standiye! Paşê xwe avête erdê, yanê xeriqi. Xelkê ji tirê rast e, av anin û ser

diya te ya sêrbaz da kırın.

Gulê binek stand. Fıkiri û bî dengeki fetisi got:

- Em gereke ji hev veqetin. Diya te rê nade bext-mırazê me, ew ê jiyanı me a şirin tehl û reş bîke. Vegere bal diya xwe. Wê ji te ra ji baş be, ji mîn ra ji.

- Tu beri mîn dîdi? Bê hemdê xwe mîn jê pîrsi.

- Na, lê gereke tu vegeri ba diya xwe. Jî mîn bawer bîke, usa wê dîha baş be.

Mîn êdi tiştek negot, deri lî peyi xwe dada û derketim çûm.

Jî çemê Kur'ê bayê meha ilonê ya sar sûretê mîn dixist. Lî dor-berê mîn denge insaneyi nedihat.

Lî ser pîrayê ra derbaz bûm, lî baxa kîleka Kur'ê lî ser kursiki rûniştîm. Xem û kulan ez hîldam...

Mîn zehmetiya tenêbûnê texmin kîr. Qet nîzam çawa hêsîr ji çavên mîn bariyan. Ez dîgîriyam...

Paşê ez ji baxê derketim û berbî mala

diya xwe çûm.

Çend mehan şûnda, diya mîn keçêke "bî dîlê xwe" ji mîn ra dit. Ew dewleti bû, lewma cihêzeki baş bî xwe ra ani. Lê çi ji mîn ra, wexta dîlê mîn têda tune bû...


Ne ji niha ez ji wê hîz dîkim. Du zarê mîn jê hene. Hîzkîrin, tek carekê dî dîlê mîn da işq û gul veda û her tiştên dîn, tenê wek biraninan man.

Wan pêlan, ez dî metroyê da rasti Gulê hatim... Bawer bîkin mîn bî zorekê Gulê nas kîr. Em lî ber hev derbaz bûn. Bî fikra mîn ewê ji ez nas nekîrim, yanê ji nas kîr lê xwe lî mîn nekîre xwayi... È ne ewqas sal derbaz bûn, ez ji hatime guhastinê... Ax, felek, felek...

Diya mîn zûda ne sax e. Bîla rehme lê be, lê bes ewê ji, bî gotina xwe riya mîn şaş kîr û dîlê mîn dax kîr.

Jî gurci wergerandin: Casim İnsan

Xebateke
wênekêşa
kurd
Besa Payele,
ji Gurcistanê.



MEM Û ZİN

wek radyo-dramatik - 4

ROLÊN DRAMATÊ

MEM: Zirkurê Alan Paşa
ZİN: Dota Mir Seydin
QISEDAR (MÊR): QM
QISEDAR (JIN): QJ
HESP
QERETAJDİN
ERFAN
ÇEKAN (Çeko)
BEKIR (Beko)
DOTA BEKO

Raryodramatizekîrin:

ROBERT ALFTON

Wergerandin ji swêdi: Xalit Lezgin

MEM

Ez ji qet gustilka te ji tiliya xwe dernaxim.

HESP

Bînihêre Memê- tu dibini Zinê dest davêje zêrên stuyê xwe.

ZİN

Ha bigre van, madem ev e xwesteka dîlê te.

HESP

Memê bibine, Zinê carek dîn destê xwe bire stuyê xwe. Ew ê daxwaza te bî temami bine cih.

ZİN

Yekê ji van bac e, yek bertil e,
Ev yeka ji nişaniya Çekan e,
Lê bizanibe, ev bî qasi xercê Cizirê
Yê heft salan giran e.

HESP

De Memê, içar tu ghiştî mirazê xwe, te bac û bertil girtün. Nuha em ê vegevî ber derê mala hersê biran.

MEM

Bî xatûrê te Zina delal.

ZİN

Disa vege were ba min, axayê min.
(Memê hespê dajo, ber bî mala hersê biran)

MEM

Ha birano ji we ra du zêr. Yek bac e, yek bertil e.

HER SÊ BIRAN

Te ew ji Zinê standin?

MEM

Ev zêrê dawin nişaniya Zinê ye.

HER SÊ BIRAYAN

Nuha em birayê te yên piçûk in.

QERETAJDIN

Êdi tu bûyi birayê me yê mezin. Nuha te em bêgav kîrin ku êdi em her sê, ji iro pê va te wek birayê xwe yê mezin qebûl bikin.

MEMÊ + HER SÊ BIRAYAN

Em çar bira ne, li çar hespan siwar in.
Dî destê me da mertal û gurz in.
Em bî ger in, bî dehw û doz û hawar in.
Em ê binin ji birayê xwe ra, wê Zina delal,
Çav û biruyên wê reş û belek in.
Em çar bira ne, li çar hespan siwar in,
Lî vê dînê navê me heye, camêri karê me ye.
Em ê ji birayê xwe ra binin wê delala bengin e,
Ya ku dîlê wi jê ra bî hezkîrin û evin e.

QM

Sê roj di ser ra derbas bû, hîngê Beko ji Mir ra qala serfîraziya Memê kîr. Ku ew ji nuha pêda birayê mezin ê Qeretajdin, Çekan û Erfan e.

SEYDÎN

Şiveke baş amade bikin. Ez ji dixwazim
Memê bieziminim.

QM

Dû ra Mir qasîdek şand pey her sê birayan,
ku wérin cem wi. Ü ew ketine ser rê berê xwe
dane koşka Mir.
(Dengê nalê hespan)

HESP

Memê, haya te jê heye, Mir wê diyariyekê bide
te. Tu çi dibêji?

MEM

Gotina te rast e, wê wîsa bike.

HESP

Memê, tu dixwazi di mala Mir da, ciyê ku
Zinê lê ye bîmîni?

MEM

Belê çawa na! Xwestina mîn tenê ew e ku, ez
lî ba Zinê bîm, tişteki dîn naxwazîm.

HESP

Wê çaxê li mîn guhdari bike Memê, çi xelat û
diyariyan negre ji Mir Seydin. Tenê kîncêñ
aşpêjiyê bigre. Lî aşxana serayê kar bike.

MEM

Hîndik ma ez û Zinê bigihijin hev, her roj bî
hevra bin, şâ û dîlxwêş bin.

QM

Pışti ku nan xwarin, sıfre rabû, Mir destê xwe
bilind kîr.

SEYDÎN

Memê eger du bî eslê xwe ne maqûl ji bi, tu
bî xwe maqûl i. Eger tu kurê şivaneki yan ji
gavaneki bi ji, disa tu meriveki maqûl i.
Lewma ez ji te dîpîrsim ka tu çi dixwazi ez
pêşkêşî te bikim.

MEM

Bî rasti, Mirê mîn tenê yek daxwaza mîn heye,
ku ez çend meheka wek aşpêj li diwanxana te
xizmet bikim.

SEYDÎN

Zû ji Memê ra kîncêñ aşpêjiyê binin, bîla li
xwe bike. (Deng effekt.) Ew ji iro pêda
qahwebirê mîn e.

QJ

Jî wê rojê şûnda Mem û Zin li bînê yek
baneki da dijîyan û herdem bî hevra wextê xwe
bîşayı û kîfxweşî derbas dikirin.

BEKIR

Keça mîn, êdi gotina mîn lî ba Mir pere nake
qet bî mîn naşêwîre. Geleki ji Memê hez dîke
qimeteke giran dîde wi.

DOTA BEKIR

Mêmê, Zinê ji destê Qeretajdin û birayê wi
derxist. (Dengê qûma remildariyê.) Memê
şareza, bî riya qenc û bî saya camêriya xwe
dîlsoziya wan qezenc kîr. İcar tu bîbîne ez ê

çawa bî şarezi û remildariya xwe wi pol-poşman bikim.

BEKIR

Çı dînivise dî remla te da?

DOTA BEKIR

Nuha ji ber evinê çavêن Memê tu tişteki nabine, bî wi awayê ku wi berê ji mîn hez dîkîr...

QJ

Memê wîsa bî Zinê mijûl e ku êdi nîzane çawa roj û şev derbas dibin. Sîbe, nivro, êvar kengê ye, hay jê nine.

BEKIR

(Desten xwe lî hev dixe.) Qahwe!

MEM

Wey ser seran! rûspiyê zana, aqlmendê Mir Seydin, Ez derhal ji te ra qehwa nivro tinim.

BEKIR

Ev çi wext e tu dizani? Bûye êvar hina tu qehwa nivro tini? Ma ne şerm e, ne bêhurmeti ye lî hember Mir û me!..

MEM

Keremke, wê çaxê ez ê nuha qehwa êvarê binim.

BEKIR

Mirê min, qehwa te ya sibê nivro tê, ya nivro paşnivroyê tê, ya paşnivro êvarê tê. Memê bî qesti weha dike û bêrûmeti û bêhurmetiya xwe lî diji Mir nişan dide.

SEYDÎN

Bekir, dibe ku adet û usûla welatê wi wîsa be. Dî vê yekê da mebesteke xerab yan ji bêhurmeti ez nabinim.

BEKIR

Mirê min, eger destûrê bîdi min ez dixwazim pêşniyazeki lî Mir bikim: Ez dibêjim êdi wextê nêçira xezalan hatiye. Em derkevin nêçirê...

SEYDÎN

Bekir, pêşniyaza te lî ci ye. Xeberê bîdine gire-girêن Cizirê, em ê sibê derkevine nêçirê, bila Memê Alan ji bî me ra bê.

QM+QJ

(Bî defa hewarê ra bang dikin.) Geli Cizirya! Sibê Mir Seydin derdikeve nêçira xezalan. Hemû gire-girêن Cizirê wexwendiyê wi ne!

ZIN

Memê, bavê mîn sibê diçê nêçira xezalan, wê te ji bî xwe ra bihere nêçirê.

MEM

Zinê, ez ê çawa te bîhêlim û herim nêçirê? Ez qet naxwazim lehzeki ji te vejetim evina mîn!

ZIN

Memê, tu xwe lî nexweşiyê bavêje. Wê sibê werin pey te, tu bêje ez nexweş im. Hema carekê ew lî hespên xwe siwar bûn êdi tu şayışan meke, ew ê herin û êdi heta şes yan ji heft rojan venagerin. Hingê ez û tu em ê herin nav xas-baxçen nependi û lî wir bikin kêf û henekan.

QM

Roja dîn, Mir û gire-girêن Cizirê, Qeretajdin û birayên wi ji digel wan, hespên xwe ajotin ber dergehê koşka ku Mem lê dîma.

BIRAYAN

Bîra de haydê! Hespê te ji hazır e.

MEM

Jî Mir ra bîbêjin: Bî rasti ez iro nexweş im.

BEKIR

Memê xwe lî nexweşiyê davêje. Nêçirvaneki mina wi, dî rojêن weha da xwe nadîn paş. Çima naxwaze, helbet planeke wi û Zinê heye.

(Dûmahik heye)

ŞIROVEYEK DI DERHEQA GOTINÊN PESİYA DA Û HIN NIMÛNE

Şirove û berevkar: B. DERSİM

Zargotin û çanda gel gora avûheva (iqlim) cıvaki bejn dide û mezin dibe. Rewşa cıvaki, ya abori û siyasi lı ser zargotinê tesir dike. Bûyerên ku di wexta xwe da lı ser dirok û psikolojiya gel tesirên mezin hıştine, dibin babetên zargotinê. Gel wan bı gelek şıklan tine zman û dide jiyandin.

Gotinêن pêsiya yek ji wan babetan e. Kok û riçala wan di dirokê da gelek kevn e. Ew ji nesleki derbazi neslike din bûne, gora zaman hin tişt lê kêm û zêde bûne û xwe gihadine vê rojê. Metelok, serbori û fîkrênen neslan in û ew ji qırnêن kevn dilopin û têن. Xwediyê wan gel bı xwe ye. Lê diyar e ku hin kesen zana û jir ew kırine vê qaliba hanê. Lê disa ji ew bûne malê gel. Ew bı gotinêن kin û vekiri û bı mane û fîkrênen tiji ve gelek tişt tinine zman. Pir caran di cih de karanina yek metelokekê dikare pêsiyê lı gelek gotinêن dûr û dırêj bigire. Ji ber ku ew gotin bı tecrubeyên salan û ditinêن cur bı cur hatine xemilandin. Ew tecrube û ditinêن ku ji kûrahiya dirokê derbaz bûne, dilop dilop hatine nitirandin, ketûne ser hev û di qalibê cıvaki de forma xwe dine. Neslên nû ji gora şert û rojê him ditinêن berê ku tê da cih girtine dibijêrin û him ji ditinêن xwe dixinê.

Ew gotinêن han raste rast bangi aqil û fîkrê meriv dıkın. Bı pirani naveroka wan rast e û mina bendeke destûra cıvaki xwe dane qebûl kırın. Çimku, ew di jiyanê da hezaran caran hatine ispat kırın. Lê çi heye ku hin ji wan

gora şert û zurufê dema xwe hatine gotin, gora iro belkê ne realist in û kevn in. Hin ji wan diji hev in, lê divê ji bira me nere ku cihê wanê karaninê ji hev cuda ne.

Ew mina gewherên hêja ne. Ji merivan rasiya rast, riya jiyanê rawe dıkın. Lê dibe ku hin nimûne, gora şirovekirna metelokê netice ji nedin, ew ji bo piraniyê têne qebûl kırın. Weke nimune "Silav lı paryê hazır e." İnsan lı menfaeta xwe digere. Cihê ku tê da ji bo xwe fêde dibine, xwe lı ber xweş dike. Pir hindik mistesna hebin ji, bo pirani ew gotin rast in. "Bı insan emel nabe, şirê çig mêtîye." Nayê wê manê ku tu lı hemû insanın bı şık binîhêri. Lê divê haya te ji te hebe. Tu bira neki ku, kesen ku bêbextiyê, şirheramîyê bikin gelek in.

Hînek ji wan, gora çand û pivanên cıvatê yên rojane ji endaze derva ne. Lê ji ber ku ew bı mana rexne, cihê rexnê de têne karanin.

Xisûsiyeteke metelokan ji ew e ku, di nava gelek milletan da gelek gotin sedi de sed nebe ji, pir nêzikayı lı hev dıkın. Ew ji işaretâ wê yekê ye ku hemû millet di dirokê de yêk şêmokê de derbaz bûne. Ya din ji riya rasti û rindiyê, riya aqil û zanistiyê yek tişt e. Meriv çiqas bı coxrafi ji hev dûr be ji, bı aqli nêz e.

Her milletek gora jiyana xwe, gora eleqe û têkiliyên xwe bı tabietê ra navan kartini. Hesp, ga, kûçik, teyr û tûr, dar, çiçek, ...ûyd. Di jiyan û serboriyên gelan da çi derbaz bûye, ew bûne naveroka gotinêن pêsiya.

Meriv ji wan metelokan dikare dereca jiyana milletan, norma exlaq û kultura wan pê bihese.

Gotinê Pêşıya hin xisûsiyetên xweyi berbiçav evin:

Gotinê pêşîyan malê milet bî xwe ne, niviskarê xwe ne xûyani ne.

Ew ji kûrahiya dirokê dîherikin tê, ji nesleki derbazi nesleke dîn dibin û dijin.

Bî gotinê kin, mane yên freh bî xurti tinine zman.

Zmanê metelokan basit e, hemû kes dikare xweşik fêm bike. Mesajên ku didin direkt in.

Metelok; giya, dar û ber, teyr û tûr tiştên ku her wext meriv dikare lî dora xwe bibine hatine çêkîrin.

Xeta xwar ji gayê pir e.

Heft lawê Punê hebûn, qencê wan kune bû.

Kera pişkul dizani qırık kuva tê.

Golikê malê ji gayê malê naturse.

Tu ku diz bi, wê sevîn res pur bin.

Şeva res di êvar de kûf e.

Kûçik xwediyê xwe nas dike.

Kûçik hesti dixwe, hesti derdixine.

Qala kûçik bikin, ço bigirin destê xwe.

Kûçik hesti dixwe hesavê kuna xwe dike.

Kûçikê xwe bera me mede, lazimê geşa te nine.

Kûçikê ku dev bike, qilê xwe nişan nade.

Taji yê ku bi zorê here nêçirê, wê ci nêçirê bike?

Lî kûçik teng bê, wê ji taji zêtur bazde.

Mezin avê dirijinin, zarok tê de dilizin.

Yekê ku dizane dizanê, ye ku nizani purnaga niskê ye.

Meriv mir sünde kunzérini dibe.

Gava ku ga mir, kîr li ser pur dibin.

Gayê din her tim golik e.

Benîsta dinan ne ritulek be nacûn.

Mirovê di nava avê da bi ji baranê naturse.

Bî zorê çavgirtin xew nayê.

Bila serê te rehet be, qe ji zikê te burçi be.

Rovi neçû qulê hijik bî doça xwe va girê da.

Şahadê rovi doçika rovi ye.

Sirê lomê xwe ji pivazê kir.

Xebera te xwes xeba e lê min ji te ne bawer e.

Gotinê pêşîya xwedi du mane ne. Mana nêz ji serboriyan hatiye derskirin. Mana duwem ji, gora nimûneyan û şiroveyan têne guhartin.

Heke meriv bikare ji wan dersan bistine, ew xezineyê hêja ne.

Milletên paşdamayı edebiyata devki zêtür bi kartinin. Milletê Kurd ji xasima ji ber rewşa xwe yê siyasi mecal nedîye ku bî zmanê xwe dî welatê xwe da dibistinan veke, xwendin û nivisandina Kurdi hin bibe. İro ji ew imkan tune. Jî ber vê yekê edebiyata me ya niviski zêde pêşketi nine. Lî gelek kes hevil dîde ku zargotin û çanda me bikeve nava rûpelan û winda nebe û wek milleti ji karwana milletên hevdemi şunde nemine.

Çiya çiqas bilind be wê rojekê rê pêkeve.

Şehîn bîha li ba keçelan e.

Zaliman ra têkeve niqaşê, lê bî nezan an ra na.

Ji ber nefsê kete hevsê.

Tu ku nabi gul, mebe stri,

Me xatûn li jêr ji dit, li jor ji.

Dest dayê pil jê xîlas nake.

Çiyayê bêgûl û merivên bêdil weka hev in.

Bî desteki çepik nayê lêdan.

Destê tenê deng jê nayê.

Ker digere rasti hefsarê xwe tê.

Kesê ku nebuye şivan, pezçerandin çiye nizane.

Giyayê hevsê bî ga tal e.

Du seri ne weka hev bin narine ser balgiyekî.

Yênu devan xwedi dikin deriyê xwe bilind çê dikin.

Lî ser kûçik geli çê nabin.

Kund li pagan dixwinin.

Pirê baver nedikir mîr bike, mîr kiriye dawa malê zérini dike.

Mêjo taca zér e, lê nesibê herkesi nine.

Dilê mîrik dibijîya göstê kerê, go, guhê xwe düşbinin yê kevroskê.

Ha li çökê, ha li navê.

Yênu terin masiyan wê kuna xwe sil be.

Kesê ku kete govendê divê xwe bihêjine.

Aş çûye pêy çeq çeqokan ketiye.



Strana folklori

Naverok û Xusûsiyetên Wê

Ahmed Muhammed Ali

PÊSGOTIN


Muzika Kurdi, ci ya folklori ci ji ya nûdem, di pengavek (periyod) zehmet da ye. Zehmetiya yekem windabûn û ji qalibderxistina muzika folklori ya Kurdi ye, ya duyem afîrandina puraniya dibistanêñ muziki yêñ nûdem ji bingehêk muziki ya akademik bêpar e. Dibe ku dizikirina folklor me ne giredayi irada me be, ji ber ku ew giredayi rewşa me ya giştî ye, lê windabûn û xerabkirina folklor me bi destê hunermendêñ Kurd, ji tênegihiştina me ya derbari rola folklorê û şêweyêñ têkili digel wê folklorê ye. Lewma ji, em di pirtûkxaneya Kurdi ya muziki da valahiyeyeke mezin dibinin. Ev valahi di warê teorik da, di derbari van xalêñ jêrin da heye:

- a) Definisyona (tarîfîkirin) folklorê
- b) Rola folklorê

- c) Metoda lêkolin li ser muzika folklori
- d) Metodên qeydkirinê
- e) Metodên ji hevderxistin (analiz) û bi hev va kelandinê (sentez)
- f) Metodên danberheviya folklorâ Kurdi bi yêñ gelên derdorêñ me ra.

Dibe ku li ser "strana folklori" hûn hewldan peyda bûbir, lê ew hewldanêñ heyi pîr caran tenê di derbari strana folklori da li ser;

- a) nîvisandina tekstên stranan
- b) nîvisandina notayêñ stranan
- c) li gor naveroka tekst û ritm li ser senifandina stranêñ folklori sekunine, lê ne li ser "muzika folklori". Bi qasi ku em dizanîn, "strana folklori" beşek ji "muzika folklori ye.



(Desen: ji kovara Ö. Gelecek)

Ji ber vê yekê ew xebatên heyi, kêm in, ji ber ku hemû giringiyên lêkolina akademik û muziki bi kar neanine.

Di derheqa muzika folklori da bi zimanê din gelek nivisarên, ku dikarin alikariya lêkolina muzika folklori bike, hene, lê mixabin ku ew bi zimanê Kurdi nehatine nivisandin, ango nehatine wergerandin. Pirtûka E. M. Ali ya bi navê "Strana Folklori, naverok û xusûsiyetên wê" yek ji van e. ji ber vê yekê em vê pirtûkê werdigerinun zimanê Kurdi. Pêra ji, em, tarixa çapkırına pirtûkê (1976) didin ber çavan. Dibe ku hin ditinên pirtûkê, ji bo dema iroyin ne aktuel bin, ji ber ku:

1- Pêşveçûna metodên lêkolinê ji 1976 vîrda gelek qonax stendiye û afiriye.

2- Dibe ku stranek di serdema afirandina xwe da populer be, lê di nava zeman da dikare rengdêrê (sifetê) "strana folklori" bigre û bikeve nava folklorê (bi taybeti di cwata Kurda da)

3- *Li gor baweriya me, li gor çin û qatên civaki senifandina cihê stranan, girêdayi şertên subjektiv ên her civati ye. Ango peydabûna kultura afirandinê û guhdarikîrinê, girêdayi kifşbûna sinorên navbera qatên civaki ye. Ü ji ber ew sinorên qati yan ji çinayeti di civata Kurd da rûnenistiye, ditinên niviskar (derbari vê mijarê da) ji bo civata Kurd ne aktuel e. (Bînhîr li "Strana Geléri ya Populer (Populer Song))*

Herweha em vê pirtûkê, ji bo tijekirina beşeki valahiyê werdigerinun. Dibe ku ev wergera han, bibe kişkirinek pozitiv ji bo lêkolin û gengesiyek freh, ku bikaribe xizmeta muzika Kurdi bike.

STRANA FOLKLORİ **Naverok û Xusûsiyetên Wê**

Li ser naveroka "strana folklori", di navbera civata muzikvan û muzikzanan da gengesi (munâqeşe) heye:

Hinek ji wan dibêjin ku, "strana folklori", ew stran in ku herdem dî nav gel da têr strandin, bêyi cihê afirandinâ wê bête kifşkirin, çi li gundan çi ji li bajaran. Hinekên din ji, "strana folklori" weha rawe dikin: awazên ku gel kêfa xwe jê ra tine, bî riya guhdarikirinê jiber dike û tekrar dike. Û em dikarin li ser van ditinan nêrinek din ji zêde bikin: ne şert e ku xwediye stranê nenas be, herweha xwediye strana folklori dikare naskiri be ji. Hin ditinêr din ji hene ku, li ser bingehêr ilmi, li ser naveroka stranêr folklori lêkolinêr kûr û baş çenekirine.

Strana Folklori parçeyek ji muzika folklori ye. Muzika folklori ya ku ji van besen jêrin tê avakirin. 1- Awazên strani. 2- Awazên instrumental. 3- Instrumenten muziki, tipê wan, diroka wan, şıklê wan û sifetê wan in. Dî jiyana civatek an ji xelkek taybeti da, ev bêjeyen han dibin kaniya huner ên heri gelempéri. Formen muzika folklori, bî giştî bûne belgeyên jindar û rastibej ji bo tebieta civatek, diroka wi, deng û behsên wi, serpêhatiyen wi û hest û daxwaziyen wi ku ji serboriyen wi çêbûne û bûne ruhiyeta wi ên karekteristik. Ji ber vê yekê, lêkolinvan û kompozitoren muzikê bala xwe dane ser muzika folklori, ji bo civandin, qeydkirin û tesbitkirina elementen wê, dî vê xebatê da para mezin dane strana folklori. Ka em bizarin ku tarifa (definisyona) "strana folklori" çi ye?

STRANA FOLKLORI (Folksong)

Strana folklori, wek strana folklori ya rasti (real folksong) ji tê bî nav kirin. Strana folklori, we stran in ku dî gundên cotkar û cihêr gundi yêr ji bajaran dûr têr afirandin û dom dikin. Bartok weha dibêje: Strana folklori, ew stran in ku dî nav civatek mezin da peyda dibin û demeki drêj dijin. Ew stran, bî formeki huneri û civaki tebiet û karektera taybeti ya jiyana civatêr ji bajaran dûr dide

aşkera kîrin, ew jiyana ku ji jiyana bajariyan cihê ye. Em li cem bajariyan dikarin du formen stranan bibinin:

1- Strana Gelêri ya Populer (Populer Song)

Em dikarin veşä han wek "strana folklori ya çêkiri" (composed) ji bî nav bikin. Şêweyê (uslûb) awazên van stranan li gor şêweyê "strana folklori ya rasti" hatine çêkirim. Lî awazên wan, bî destê beşek ji bajariyan û li gor gengaziya (imkan) wan a huneri ya sinorkiri tê avakirin. Ew awazên ku ji ali beşek ji bajariyan tê çêkirim, lêxistin û xwendin tenê li ser bingeha guhdarikirinê tê amadekirin û nikarin notayê awazên xwe binivisin. Bî vi rengê hin rengdêren (sifet) "strana folklori" distine û ev stran li xweşa beşeke civatê dice. Ev beş ji, beşä navbera xelkê gundi û qata dewlemend e. Stranen qata dewlemend taybeti ne, ji ber ku him bî naveroka xwe him ji bî rengê xwe ji strana folklori ya populer cudatirin. Stranen gelêri yêr populer li cem me geleki in.....(1) Ev stranen han ji ali gel ji berê va têr jiber kîrin û tekrar kîrin. Hinek muzikvan digihijin wê baweriyê ku, van stranan, "stranen folklori yêr rasti" (real folk song) ne. Lî rasti ne ev e. Ji ber ku van stranan li ser destê muzikvanen naskiri yêr sê-çar nifş berê (qesd, sih-çil sal berê ye) yan ji bêtir, yêr ku wê demê dî warê muziki da li bajaran peyda dibûn, hatibûn sazkirin. Van muzikvanan, wan stranan çêkirim û dî şin û şahiyen da, dî programen muzik ên taybeti da, ku xizmeta kar û barêr wan dikirim, pêşkêş kîrin. Ev stranen han populer bûn, domkirim û ji nifşeki derbasi nifşeki din bûn; xelkê jiber dikir, ji ber ku xweş bûn û têgihiştina wan ji bo gel hêsan bûn.

2- Stranen bî serüber (Composed Song)

Koka van stranan, bajar e û şert ew e

ku, niviskarê stranê û afirandêrê awazê stranê naskuri be û divê notaya wi ya muziki ji hatibe nivisandin. Se-wiye û bîhayê stranê ya huneri girêdayi gengazi û zanebûna kompozitor e. Dibe ku ev stran di demeki sinorkiri da bibe populer û li nav xelkê belav bibe, lê eger izgekirina wê neyê domkirin dikare bête ji bir kîrin. Ev stran berevajiyê "strana folklori ya rasti" ya ku nayê ji bir kîrin e

3- Xusûsiyetên Stranê Folklori

Tevi em dizanın ku, ferqiyetên coxrafi, civaki û kulturi li ser gewher û naveroka stranan bandora xwe hene, li cihanê rengdêrên wan ji ev in:

1- Stranê folklori, hunera xelkê nenaskuri ye (anonymous). Kesênu ku nivisine û awazên wan çêkîrine, nenas in. Ev stranê han di civatek mezin da, di hin şertên sinorkiri da tênu afirandin û demek dûr û dirêj dijin, dom dikin. Ev nayê wi maneyê ku, afirandêrê wê tuneye. Xwediye wê heye lê nayê naskîrin û sîrê ciwanbûna wê ji di vê derê da ye, ji ber ku dibe hunerek kollektiv ê civatê (kollektiv art).

2- Jî tradisyonêni guhdariyê (oral tradition) tênu, bî devki ji nifşeki derbasi nifşeki din dibin, yan ji, jî demeki derbasi demeki din dibin.

3- Variyantên stranê folklori gelek in (variants). Ango dibe ku jî yek strani ra gelek form û şêweyêne pêşkêşkirinê hebin. Ev formen han girêdayi stranbêjên cuda û navce nine, ji ber ku eyni stran ji ali dengbêjeki dikare bî du formen cuda bête pêşkêşkirin. Wek minak, em dikarin ferqiyek bicûk di dirêjkirin an kurtkirina nota û metoda pêşkêşkirinê da bibinin, lê form û şêweya stranê ya giştî wek xwe dimine, angolî ser bingeha xwe ya himi dimine. Bartok weha dibêje ("Serbo-Croatian Folk Songs", Bartok Bela, rûp: 19) : Pirvaryanti fenomenenêke kifşkirin ye

dî muzika folklori da."

4- Stranê folklori xwadi avahîyeke homojen (homogenus) in, an ji şêweyek avakırma wê ya giştî heye. Ango em bî eyni form û bî eyni şêwe dikarin bî dehan an bî sedan stran peyda bikin.

5- Ev stran, wek encamek şertên civaki yêni sinorkiri, bî rangeke sıruştı ji ber xwe va ava dibe. Dî nav xelkê gundi da, dî nav xelkê basit da tênu afirandin û piri caran bî rengeki otomatik an ji bî zanisti diafirin.

Werger : Xoşnav û A. Gernas

TÊBINI:


1- Bartok, kompozitorek Macari ye. Ew di sala 1881'an da li Nagyszetê hatiye dinê û di 6 saliya xwe da dast bî muzikê kiriye. Gelek lêkolin li ser "muzika folklori ya Macari û gelên ciran kiriye. Lêkolinêni wi, zêtir derbari kifşkirina karekterên bingehin ên saf ê Macari da ye. Di sala 1945'an da li New-Yorkê çûye heqîya xwe.

2- Hin nimûneyên ku niviskar ji stranê Erebi dide, ji xwendevanên me ra biyani ne. Dêlva wan da em hin stranê Kurdi wek nimûne didin da ku armanca niviskar bî hêsanî bidin aşkerakirin. Wek nimûne, em dikarin strana "Şev Çû" bidin. Dî dema iroyin da gelek ji nifşen nû afirandêrê vê stranê nas nakin û gelek caran ev stran wek "strana folklori" tê naskîrin. Lê bî rasti ev stran, dikeve beşa "strana populer", ji ber ku afirandêrê wê naskuri ye û ew, Cigerxwin û Aramê Dikran in.

Navêñ daran

Yên bê ber:

Spindar (sîpidar), qewax, hewr
Dara(*) bih, bi, bihi, çevirbih
Dara mazi, berû
Çınar
Çam
Akasya, aqesiye
Merx
Dêdar
Benav, bînav
Bizi
Saqol
Surdar
Çekem
Dara jehrê
Dirîk, dirri
Dara sûsê
Darbenişt
Kenêr
Dara hêzeran
Sîwak
Kevot
Kîzwan, kewzan, benik



Beşen darekê:

Kok (reh û riçal), gewde, bask (guli, şax), çıqıl, pel (pelg, belg), qaçıl (qaşıl, qalık).

Yên bî ber:








(Evana bî navê mîwe yan ji berêñ xwe têñ naskirin.)

Mêw (dara tûriyê)
Tîrireşk
Hîrmi, hîrmê
Karçin, karçık; şekok
Hînar
Sêv

Hêrûg
Hêrûgareş (keremamox)
Alûnce, alûçe,
Behiv
Vişne
Incas
Biyok




(*) Du zayendêñ (genus) peyva dar hene. Dema ku hê ter an ji bijûn e, zayenda wê mî ye; lê pişti ku bê birrin an ji hişk bibe êdi zayenda wê nîr e. Nümûne: dara mazi (ku hê ter e); darê mazi (ku êdi hişk bûye).


Şeftali, xox
 Zerdali, müşmiş, arûng
 Tû
 Gûz
 Tawi
 Kîfri
 Gijok
 Rîxok
 Çavreşok
 Hêjir, hêcir
 Qızwan (dara benistê)
 Şilan
 Huli
 Gîvij
 Bilalûk
 Fındıq, findeq
 Fıstıq, fisteq
 Darxurme
 Sînc
 Gusînc
 Zeytûn, zêtun
 Nûdinya
 Bitim, darebenk
 Kestane
 Darenan
 Mişmila
 Garis
 Qeresi
 Dara gezi



Çend navên giştî:
(Bî babeta dar va girêdayî)

Daristan
 Dahl, dehl, dol
 Mêše (Hîm navê darekê ye, him ji di
 maneya daristanê da tê bikaranin)
 Rez
 Bax, baxçe
 Çilo
 Çırpi
 Satar
 Tûm, devi





Biha: 15 Skr.